

Nivîskarên Paşerojê



Eve ji mêje ye gelek xwendevanên me gazinda diken ku me çî cih di Kepirê da nedaye zarokan ku berhem û nivîsînên xwe têda belav biken. Bi rastî jî gazindên wan di cihê xwe da ne. Le wa me birîyar da em van her du rûpelên Kepirê ji nivîsîn û dahênanên wan ra bihêlîn hem wek han danek ji bo behreyên wan û hem jî ji bo dewlemendkirina Kepirê. Kepir li benda berhem û nivîsînên we ye û tikaye nav û temen û - eger we bivêt - wêneyekê xwe jî bikene digelda û bigehîne me li dezgeha sipîrêz.

Mirovî çend kumelêt xwînê hene?

Hîvî Îslam

Kumela "A": Helgirê vî curî dişêt xwîna kumela "O,A" werbigrît.
Kumela "B": Helgrê vî curî dişêt xwîna kumela "O,B" werbigrît.
Kumela "AB": Helgrê vî curî dişêt xwîna kumela "AB" û hemî kumelêt dî werbigrît.
Kumela "O": Helgirê vî curî dişêt bes xwîna kumela "o" bi tinê werbigrît.

Zarukê Çalak

Cihad Cimîl Salih
Diwanavincîya Ala

Di xanîekê biçîk ve di nav bajêrê da zarûkekê îtîm (orfan) digel deyka û xîşk û birayên xuyên biçîk dijîyan. Ew qutabî bû digel hindê kar dikir bû xudankirina deyk û xîşk û birayên xwe ji ber hindê gelek kar dikete ser milên wê. Lê ew zarûk gelekê zîrek û çalak bû xwedan hîvî bû ji ber hindê wî bi rijdî hewl da baştirîn şêwe kar biket li ser hemî nexweşî yên xwe da bû rûhn kirna paşeroja xwe raste ew orfan (îtîm) bû lê digel hindê jîyana wî ya pir bû ji xweşî û çalakî ya.

Çend pêzanîn li ser kumpîterê

Alan Kamîran - Çira nîyaz

Ji mêje mirov bizavê diket karên dijwar û giran bi sanahîtirîn şêwe bi mandîbûneka kêr û bi demekê zo bicîh bînin. Ji ber vê rojane hizr diket amîrên taze bi efrînît. Ewên hizr diken ji bû dahênana tiştê no dibêjnê "zana". Bu nimone: Ji bi wî veguhaztina tiştan û hatin û çûnê miruvî 'erebane û tirumbêl û şemendefr û papurufiroke dahênayne û dirust kirîne. Ji bi wî amadekirina xarnê kuç û supew tebox û hîter û aman dirust kirîne. Ji bi wî xwe ji tarîyê qurtal biket û bi bînit xetîrew çiraw mûm û fanûs û lempew gilûp dahênayne. Her bi vî rengî ji bi wî tişt ji bîra miruvî neçin û bi asanî û xêra tiştî bizanît û jîmaran lèk bidet û li sertaserî cîhanê şareza bi bît û pêzanînen heme reng werbigrît bi lez hizr biket û xeletî yan neket kumpîter dahênaye...

Helatin

**Roj dihelêt
Tarî direvît
Heyv ji kerbêt
her du ka da
Di leyzît
Sitêr wekî
fîstîvalekê
Tu ser salî naçî
û navemirî
Û ava nabî
Heke xudê
nekir tu çûyî û
vemrîyayî
Hîngê hemî
hebûn
Dê bîte tarî**



Arunk Seddiq
Şero Seddiq

Danûstandin Liser Heyvê

Zêmar Zêbarî



Rundik û pêjan hevalêt êk bûn û gelek heş êk û dû dikir û herdem li şevêt sahî da li jivana heyvê mînin heta ku heyv dîtba wan herdû hevalan dît ku heyv her heyamekê bi rengekê ye hemî gava wekî tepênaya girov re şevêkê dît heyv wekî şalukê yew neya timame.

Pêjan: Rundik sexe heyvê ya kere dîyare hirçê kerê dî yê xarî.

Rundik: Nexêr hevala min balindekê mezin kerê dî yê xarî çunkî balinde li esmana difirin. Rundik û Pêjan bi şer çûn û her êk ji wan ya xu bi ser di êxist û digut ya min raste lê li dawîê birîyarda bêjine mamostaya xwe.

Rundik û Pêjan: Mamosta bu çî hindek cara heyv ya giruvir e û hindek cara jî ya kere?

Mamosta: Heyv bi gelek şêwa ya heyî û egerê wê jî erd û ruje her di nav beyna hindek ruja da heyv birengêkê yeli rujêt destpêkê demê heyv derdikevît ya giruvire lê ne ya dîyare çunkî dikevîte di nav bera erdî û rujê da.. Piştî çend rujêt dî heyv ya kere wekî şalukê ye çunkî pîçek dikevîte beramber rujê ew ker dîyar naket piştî çend rujêt dî heyv bi nivî dibît û nîva dî dikevîte beramber rujê û dîyar naket û dibêjine heyva bi nivî jî (heyva heft şevî) Piştî çend rujêt dî heyv ya giruvire wekî tepê ye çunkî dikevîte beramber erdî û erd nahêlît ruj li heyvê bidet ji ber hindê ya giruvre û ya timame û dibêjne heyva timam jî (heyva çîwarde şevî). O husa careka dî heyveka dî dihêt û her dubare dibîteve.

Mamosta: Hîn têgehiştin qutabiyêt zîrek. Rundik û Pêjan: Bi hevra gut belê mamosta û herduka ji dil supasîya mamostaya xwe kir bo van pêzanîna li ser heyvê û herduk hevalan biryar da berde-wam pêzanîna li ser heyvê kum biken çunkî heyv geleka ciwan e û şevêt tarî run diket û gelek heş heyvê jî dikir û berdewam bun liser jivanêt xuli şevêt sahî digel heyvê.

Bo kovarî Kepir

Ehmed Casim Hicî

Silawêkî germ le kangayî dile we arasteyî hemu andamanî gova-reketan dekem yek be yek hîwadarim herdem le karekantan serkewtû bin we govareketan herdem geşawe bêt be reng û berheme xweşekani û be sûdekanî. Min be çend pêkenînek bejdarî le govareketan dekem hîwadarim be dil tan bêt. Rojekî cu'ee wîstî serî bişwa mencilî nebû çû le malî cîranî mencilêkî gewreî hêna. Bo rojî diwayî cîranekeyan hat gutî kiwa mencelekem? Cu'ee gutî menceleke nexweşe beyanî were. Cîraneke beyanî hat gutî kiwa menceleke? Cu'ee gutî menceleke ferxe mencilêkî bûwe cîraneke mencele biçukekeî birdewe bo rojêkî tir cîraneke çû bo dawî menceleke em care Cu'ee gutî menceleke mirdûwe. Cîraneke gutî çon mence demrêt Cu'eeş gutî ey çon mencil mencilî

Têbînî : Kepir nivîsînên zarokan wek wan nivîsî belav diket. An ku hîç deskarîyekê lê naket heta eger çewtîyên ziman û rênvîsê jî têda hebin. Em hemî corên nivîsînê jî belav dikeyin şîr, pexşan, çîrok, zanîyarî, pêkenîn.... hitd.

Êdî dest bidene qelemên xwe û binvîsin!

